

“Tu rēzan be qurban xweş e zanebûn  
Hebûn çêtir e tim ji “na” û nebûn”<sup>1</sup>

Cegerxwîn

## “Bûn”<sup>2</sup>

Yek ji lêkera ku herî zêde tê bikaranîn û kartêker e lêkera “bûn”ê ye. Ev lêker, xwedî gellek peywiran e, wek lêkera bingehîn û alîkar tê bikaranîn, dema boriya têdeyî ya çîrokî çêdike, jê lêker tîn çêkirin û li gorî wateyê, xwedî du peywiran e. Qertafên cînavkên kesîn jî di dema niha de li şûna wê tîn bikaranîn. Ez ê di vê nivîsê de hewl bidim ku bi giştî li ser vê lêkerê bisekinim. Çewtiyên ku derbarê wê de tîn kirin û pirsgirêkên heyî destnîşan bikim.

**1. Ji aliyê wateyê ve:** Ev lêker xwedî du wateyên cuda ye. Wateya yekem, wateya “heyîn”ê ye, di vê wateyê de wek lêkera alîkar tê bikaranîn navdêran dike pêveber. Di wateya yekem de ev lêker nayê kirpandin. Wateya duyem, wateya “bûn”a tişt an kesekî ye. Di vê wateyê de carinan wek lêkera bingehîn tê bikaranîn carinan jî wek lêkera alîkar. Di wateya duyem de ev lêker tê kirpandin. Bi mînak em vê rewşê şîrove bikin.

**a. Wek lêkera alîkar:** Ev herdu wate, dema ku “bûn” lêkera alîkar be derdikevin holê. Di awayê yekem de wateya “heyîn”ê dihewîne, di awayê duyem de jî wateya “bûn”ê dihewîne. Di herdu awayan de jî “bûn” ji hêmana navdêr cuda tê nivîsîn.

### Mînak:

#### **Bûn/dema borî ya têdeyî-1**

Navê min Rizgar bû.<sup>3</sup>

Ew çî bû li ser darê?

Xwişka min mamoste bû.

Ava ku min vexwar germ bû.<sup>5</sup>

Xwarin sar bû.

#### **Bûn/dema borî ya têdeyî**

Bavê min rizgar bû.<sup>4</sup>

Porê min dirêj bû.

Dengê te bilind bû.

Ava ku min vexwar germ bû.<sup>6</sup>

Xwarin sar bû.

#### **Bûn/dema niha-1**

Navê min Rizgar e.

Ew çî ye li ser darê?

Xwişka min mamoste ye.

Ava ku ez vedixwim germ e.

Xwarin sar e.

#### **Bûn/dema niha-2**

Bavê min rizgar dibe.

Porê min dirêj dibe.

Dengê te bilind dibe.

Ava ku ez vedixwim germ dibe.

Xwarin sar dibe.

<sup>1</sup> Cegerxwîn, Zend-Avesta( Weşanên Avestayê,2002, rpl.32)

<sup>2</sup> “Bûn” ji ber ku kurt e, di vegotinê de carinan wek “bûyîn”ê tê bikaranîn.

<sup>3</sup> Li vir vegotina “bûn”ê nayê kirpandin û zûtir tê xwendin.

<sup>4</sup> Li vir vegotina “bûn” tê kirpandin û dirêjtir e.

<sup>5</sup> Germ wek “heyîn”ekê ye û dibetaybetiyeke avê û dem di ser re derbas bûye.

<sup>6</sup> Germ wek “bûn”ekê ye û ev û demeke dirêj di ser wê “bûn”ê re derbas nebûye.

**Bûn/dema bê-1**

Navê min dê Rizgar ~~be~~.<sup>7</sup>  
 Ew ê çi ~~be~~ li ser darê?  
 Xwişka min dê mamoste ~~be~~.  
 Ava ku ez vedixwim dê germ ~~be~~.  
 Xwarin dê sar ~~be~~.

**Bûn/dema bê-2**

Bavê min dê rizgar bibe.  
 Porê min dê dirêj bibe.  
 Dengê te dê bilind bibe.  
 Ava ku ez vedixwim dê germ bibe.  
 Xwarin dê sar bibe.

Dema ku em herdu awayan didin ber hev, aşkera ye ku di awayê yekem de wateya “heyîn”ê heye û qertafên cînavkên kesîn, di dema niha de li şûna “bûn”ê hatine bikaranîn. Ji bo awayê yekem, di dema niha de ku li şûna cînavkên kesîn rayeka “bûn”ê wek lêker bihata bikaranîn, wateya “heyîn”ê dervediket holê, wateya “bûn”ê derdiket holê.

Di awayê duyem de wateya “bûn”ê heye û di dema niha û bê de “bûn” rasterast wek lêker hatiye bikaranîn û rayeka wê bûye “b”.

**Nîşe:** Di awayê yekem de, “bûn” bêtir bi navdêran re tê bikaranîn û piştî wan tê. Dema ku bi navdêran re tê bikaranîn, ji aliyê wateyê ve pirsgirêk dernakeve. Di awayê duyem de “bûn” dema ku bi navdêran re tê bikaranîn bêtir di nava hevokê de cî digire.

**Mînak:**

Ez mamoste bûm. <sup>8</sup> (heyîn)	Ev av qeşa bû.(heyîn)
Ez bûm mamoste. <sup>9</sup> (bûn)	Ev av bû qeşa.(bûn)

Em heval bûn.(heyîn)

Em bûn heval.(bûn)

**Nîşe:** Dema ku “bûn” wek lêkera bingehîn bê bikaranîn, bêtir di nava hevokê de cî digire. Dema ku ciyê wê bê guhertin, ji aliyê wateyê ve dibe ku tevlihevî derkevin holê.

**Mînak:**

Hinekan dixwest misilman bibin.

Eger qest ew be ku hinek kes ne “misilman”in û dixwazin bibin misilman, divê hevok bi awayê “Hinekan xwest bibin misilman.” bê nivîsîn. Di awayê li jor de wateya “hinek kesên ku dixwazin wek misilman bînin dinyayê” heye.

“bûn” dema ku bi peyvên wek “sor, dirêj, germ...”ê re tê bikaranîn, herdu wate ji hevdu dernakevin. Di awayê duyem de “bûn” tê kirpandin.

**Mînak:**

Porê min dirêj bû(heyîn)	Xwarin germ bû.(heyîn)
Porê min dirêj bû.(bûn-dirêjbûn)	Xwarin germ bû.(bûn-germbûn)

<sup>7</sup> Di vî awayê de gellek caran “bi” ji lêkerê dikeve. Dema ku jê nekeve, dê bi awayê duyem re tevlihev bi be.

<sup>8</sup> Wateya ku ez niha “Ne mamoste me.” heye û di ser bûyerê re wext derbas bûye.

<sup>9</sup> Ev bûyer di wextekî nêzik de pêk hatiye.

### **Awayê neyînî**

Di awayê neyînî de, ji bo awayê yekem qertafa neyînî “ne” cuda tê nivîsîn; di awayê duyem de ev qertaf bi lêkerê ve tê nivîsîn.

#### **Mînak:**

Navê min ne Rizgar bû.	Bavê min rizgar nebû.
Navê min ne Rizgar e.	Bavê min rizgar nabe.
Ew ê ne xweşik bibe.	Ew ê xweşik nebe.

**Hişyarî:** Hêmana qertafa kesê sêyem “ye”, di dema niha de ji bo kes an jî tiştê sêyem, ciyê lêkera “bûn”ê digire. Ew hêman divê ji pêveberê cuda bê nivîsîn an na dibe ku bi qertafa dema borî ya dûdar “-(y)e”yê re tevlihev bibe.

#### **Mînak:**

Bedirxan raketî <u>ye</u> .(Bûn-Dema niha)	Bedirxan raketiye.(Dema borî ya dûdar)
--	--

### **b. Wek lêkera bingehîn**

Ev lêker, di raweyên deman de weke lêkera bingehîn jî tê bikaranîn. Di vî awayî de lêker bêtir di nava hevokê de cî digire.

#### **Mînak:**

##### **Dema borî ya têdeyî**

Xwişka min bû mamoste.  
Elî bû nêçîrvan.

##### **Dema borî ya dûdar**

Ew nebû tiştêk.  
Ez bûme şivan.

##### **Dema niha**

Xwişka min dibe mamoste.	Elî dibe nêçîrvan.
Ew nabe tiştêk.	Ez dibim şivan.

##### **Dema bê**

Xwişka min dê bibe mamoste.	Elî dê bibe nêçîrvan.
Ew ê nebe tiştêk.	Ez ê bibim şivan.

**2. Ji aliyê demê ve:** Ev lêker lêkereke teneper(negerguhêz)e û li gorî hemû deman tê bikaranîn. Ji xeynî peywira xwe ya bingehîn, dema boriya têdeyî ya çîrokî jî çêdike. Li gorî deman bi van awayan tê bikaranîn:

### **a. Raweyên demê**

**1) Dema borî ya têdeyî:** Di vî demê de, dema ku wek lêkera bingehîn tê bikaranîn bêtir di nava hevokê de cî digire. Rader jê tê avêtin û qertafên cînavkên kesîn lê tèn zêdekirin.

#### **Mînak:**

Ez bûm mamoste.	Ew tişt bû.
Zarok bûn rêwî.	Camêr bû derewçîn.

- 2) **Dema borî ya dûdar:** Di vê raweyê de, qewimîneke dûr û bihîstî heye. Qertafa raweyê “-(y)e” li dema borî ya têdeyî tê zêdekirin.

**Mînak:**

Ez bûme mamoste.

Ew tişt bûye.

Zarok bûne rêwî.

Camêr bûye derewçîn.

Ji bo rewşa neyînî, di herdu demên borî de “ne” tê pêşiya lêkerê.

**Mînak:**

Ez nebûm mamoste.

Zarok nebûne rêwî.

- 3) **Dema niha:** Di dema niha de, rayeka “bûn”ê dibe “b”. Beriya wê qertafa dema niha “di-” tê bikaranîn, piştî wê jî qertafên cînavkên kesîn lê tên zêdekirin. Dîsa bêtir di nava hevokê de cî digire.

**Mînak:**

Ez dibim mamoste.

Ew tişt dibe.

Zarok dibin rêwî.

Camêr dibe derewçîn.

Ji bo rewşa neyînî “na” dikeve şûna qertafa dema niha “di-”yê

**Mînak:**

Ez nabim mamoste.

Ew tişt nabe.

**Nîşe:** Ev lêker, di teşeyê raweya dema niha de bi lêkerên din re tê bikaranîn û wateya îhtîmalê jî dide.

**Mînak:**

Dibe ku ez biçim.

Îro dibe ku dêya min bibêje.

Dibe ku mirov li xwe vegerin.

Berdan dibe ku bi ser nekeve.

Dibe ku hatibe.

- 4) **Dema bê:** Di dema bê de, lêkera alîkar “dê” tê bikaranîn, rayeka lêkera “bûn”ê “b” piştî qertafa dema bê “bi”yê tê, bi dû re jî qertafên cînavkên kesîn lê tên zêdekirin.

**Mînak:**

Ez ê bibim mamoste.

Ew tişt dê bibe.

Zarok dê bibin rêwî.

Camêr dê bibe nêçîrvan.

Ji bo rewşa neyînî “ne” dikeve şûna qertafa dema bê “bi-”yê.

**Mînak:**

Ez ê nebim mamoste.

Ew tişt dê nebe.

### **Pirsgirêkên heyî**

Di hinek nivîsaran de em dibînin ku rayeka lêkera “bûn”ê “b” di dema bê de bi lêkerên wek “zanîn, karîn û wêrîn”ê re tê bikaranîn. Ev tişt, li awayê bikaranîna wan lêkeran nake û li gorî rêzimanê çewt e.

#### **Mînak:**

Ez ê bizanibim.                      Ew ê bikaribe.  
Em ê biwêribin.

Divê lêkerên wek “zanîn, karîn û wêrîn”ê li gorî rayekên xwe bînin bikaranîn û rayeka lêkera “bûn”ê “b” li wan neyê zêdekirin.

#### **Mînak:**

Ez ê bizanim.                      Ew ê bikare.  
Em ê biwêrin.

- 5) **Dema boriya têdeyî ya çîrokî:** Ev rawe bi alîkariya lêkera “bûn”ê çêdibe. Ji ber vê yekê, “bûn” di vê raweyê de dema ku ji bo “bûn”ê tê bikaranîn dubare dibe. Bi dû re jî qertafên cînavkên kesî lê tên zêdekirin.

#### **Mînak:**

Ez bûbûm mamoste.              Ew tişt bûbû.  
Zarok bûbûn rêwî.              Camêr bûbû nêçîrvan.

Ji bo rewşa neyînî “ne” tê pêşiya lêkerê.

#### **Mînak:**

Ez nebûbûm mamoste.  
Ew tişt nebûbû.

### **Pirsgirêkên heyî**

Gellek caran di vê raweyê de çewtî tên kirin, li şûna ku “bû” bê bikaranîn, “bi” tê bikaranîn.

#### **Mînak:**

Ez bibûm mamoste.              Ew tişt bibû.  
Zarok bibûn rêwî.              Camêr bibû nêçîrvan.

- 6) **Dema borî ya domdar:** Di vê raweyê de, ew tiştê ku di dema borî de qewimiye û wateya domdariyê dide heye. “Bûn” bi awayê bêrader, tê ber qertafa dema niha “di”yê. Bi dû re jî qertafên cînavkên kesî lê tên zêdekirin.

#### **Mînak:**

Ez dibûm mamoste.              Ew tişt dibû.  
Zarok dibûn rêwî.              Camêr dibû nêçîrvan.

Ji bo rewşa neyînî “ne” tê pêşiya qertafa demê.

#### **Mînak:**

Ez nedibûm mamoste.  
Ew tişt nedibû.

### **Pirsgirêkên heyî**

Lêkera “bûn”ê ji xeynî vî awayî tucarî wek “bû” derbasî vê raweyê nabe, di hinek nivîsaran de em dibînin ku “bûn” bi lêkerên wek “zanîn, karîn û wêrîn”ê re derbasî vê raweyê dibe, lê ev ne li gorî rê û rêzikên vê raweyê ye.

#### **Mînak:**

##### **Çewt**

Min dikarîbû.

Min dizanîbû.

Min diwêrîbû.

##### **Rast**

Min dikarî.

Min dizanî.

Min diwêrî.

**7) Dema borî ya pêknehatî:** Ev rawe di nava xwe de li gorî qewimîna demê dibe du beş.

**a. Dema borî ya nêz:** Di vê raweyê de ew tiştê ku di dema borî ya nêz de pêk nehatiye derdikeve holê. Divê raweyê de hevok bêtir bi şert û sedemê re têkildar in. “Bûn” bi awayê bê rader tê piştî qertafa dema bê “bi”yê û bi dû re qertafên cînavkên kesîn tên bikaranîn, bi pişt re jî qertafa vê raweyê “a”lê tê zêdekirin.

#### **Mînak:**

Ez ê bibûma mamoste.<sup>10</sup> Ew tişt dê bibûya.

Zarok dê bibûna rêwî. Te bihişt, camêr dê bibûya nêçîrvan.

Ji bo rewşa neyînî “ne-“ dikeve şûna “bi-“yê, ji ber ku wateya vê raweyê bixwe neyînî ye, dema ku ev qertaf tê bikaranîn, wateyeke erênî derdikeve holê.

#### **Mînak:**

Ez ê nebûma mamoste.

Ew tişt dê nebûya.

### **Pirsgirêkên heyî**

Di vê raweyê de jî gellek caran em dibînin ku ji dêvla ku “bû” bê nivîsîn, “ba” tê nivîsîn. Ev awa li rê û rêzikên vê raweyê nake û lêker xera dibe.

#### **Mînak:**

Ez ê bibama mamoste. Ew tişt dê bibaya.

Zarok dê bibana rêwî. Camêr dê bibaya nêçîrvan.

**b. Dema borî ya dûr:** Ev rawe, bûyereke ku di demeke dûr de pêk nehatiye nîşan dide. Hevoka duyem a bingehîn bi rêya şertî bi hevoka yekem ve girêdayî ye. Qertafa raweyê “a” li dema boriya têdeyî ya çîrokî tê zêdekirin, bi dû re qertafên cînavkên kesîn tên bikaranîn. Ji bo hevoka duyem lêkera alîkar ya dema bê “dê” tê bikaranîn.

#### **Mînak:**

Ew pêk hatibûya, ez ê bûbûma mamoste.

Te gotibûya, ew tişt dê bûbûya.

Erebe hatibûya, zarok dê bûbûna rêwî.

Te erê kiribûya, camêr dê bûbûya nêçîrvan.

<sup>10</sup> Di vê raweyê de wateya şert û sedemê, di hevokeke girêdayî de derdikeve holê. “Ez ê bibûma mamoste, lêli hev nehat.” an jî “Te alîkariya min bikira, ez ê bibûma mamoste.”

Ji bo rewşa neyînî “ne-“ tê pêşiya lêkerê, wate ji ber ku neyînî ye, bi vê qertafê dibe erênî.

**Mînak:**

Te negotibûya, ez tişt dê nebûbûya.

**Pirsgirêkên heyî**

Di vê raweyê de jî gellek caran, “bû” wek “ba”yê tê bikaranîn. Lê divê “bûn” bi awayê xwe yê bêrader bê bikaranîn. Ji ber ku ew bixwe “dema boriya têdeyî ya çîrokî” çêdike, dema ku ji bo xwe bê bikaranîn dubare dibe û dibe “bûbû”.

**Mînak:**

Ew pêk hatiba, ez ê bûbama mamoste.

Te gotiba, ew tişt dê bûbaya.

Te erê kiriba, camêr dê bûba nêçîrvan.

Wê ew kar kiribaya, dê gotibaya.

Hûn bana, hûn ê heta kengî mabana?

Wî xwariba, te yê biryara xwe daba?

**c. Dema borî ya nediyar:** Di vê raweyê de, ew tiştê ku di dema borî de pêk hatiye lê nediyariyek li ser wê heye derdikeve holê. “Bûn” bêrader wek “bû”yê tê bikaranîn, bi dû re rayeka wê ya dema bê “b” lê tê zêdekirin. Bi pişt re jî qertafên cînavkên kesîn lê tên zêdekirin.

**Mînak:**

Ez ê bûbim mamoste.

Ew tişt dê bûbe.

Zarok dê bûbin rêwî.

Camêr dê bûbe nêçîrvan.

Ji bo rewşa neyînî “ne-“ tê pêşiya lêkerê.

**Mînak:**

Ez ê nebûbim mamoste.

Ew tişt dê nebûbe.

**b. Raweyên xwestek û daxwazê:** Di raweyên xwestek û daxwazê de ev lêker li gorî pîvanên dema bê tê bikaranîn.

**Mînak:**

Bila ew bibe.

Xwezî ew bibe.

Divê ew bibe.

Eger ew bibe, ez ê kêfxweş bibim.

Bibe/bibin.

Ji bo rewşa neyînî, “ne-“ dikeve şûna qertafa raweyê “bi-“yê.

**Mînak:**

Bila ew nebe.

Xwezî ew nebe.

**Nîşe:** Di vê raweyê de ji ber ku rayeka lêkera “birin”ê jî “b” ye, “bûn û “birin” ji hevdu dernakevin.

### **Demên borî yên xwestek û daxwazê**

Raweyên xwestek û daxwazê, di raweya borî de jî dîsa li gorî pîvanên dema bê tîrî çêkirin.

#### **Mînak:**

#### **Dem a borî ya pêknehatî**

##### **Nêz**

Bila ew bibûya.  
Xwezî ew bibûya.  
Divê ew bibûya.  
Eger ew bibûya, ew ê biçûya.  
Bila ew nebûya.

##### **Dûr**

Bila ew bûbûya.  
Xwezî ew bûbûya.  
Divê ew bûbûya.  
Eger ew bûbûya, ew ê çûbûya.  
Bila ew nebûbûya.

#### **Dem a borî ya nediyar**

Bila bûbe. Xwezî bûbe.  
Divê bûbe. Eger bûbe, dê çûbe.  
Bila ew nebûbe.

### **Pirsgirêkên heyî**

Di van raweyan de jî çewtî tîrî kirin, li şûna “bû”yê gellek caran “ba” tîrî nivîsîn. Ev awa, li rê û rêzikên van raweyan nakin.

#### **Mînak:**

Ez bama min wisa nedikir.  
Tu bayî, te çî dîkir?  
Em bana, me dengê xwe nedikir.  
Xwezî te ew dîtiba.  
Tu jî tevî vêya bûbayî.

**Hişyarî:** Carinan jî ji ber ku tîpa dengdar a alîkar “w” tîrî bikaranîn, “û”ya “bûn”ê tîrî kurtkirin û dibe “î”. Bi vî awayî rayeka lêkerê xera dibe. Divê li şûna tîpa alîkar “w”yê, tîpa alîkar “y” bê bikaranîn.

#### **Mînak:**

Ew biwa, wê nedikir. Ew bûbûya, wê nedikir.

### **3. Pirsgirêka rayeka “bûn” û “birin”ê:** Rayekên van herdu lêkeran, di dema niha û bê û raweyên xwestek û daxwazê de dibin “b” û ji hev dernakevin.

#### **Mînak:**

Ew dibe.(birin) <sup>11</sup>	Ew dibe.(bûn)
Ez ê bibim.(birin)	Ez ê bibim.(bûn)
Ez bibim.(birin)	Ez bibim.(bûn)

Di raweya fermanê de ev lêker di nava hevokê de tîrî bikaranîn. Dema ku li dawiyê be wateya lêkera “birin”ê dide.

#### **Mînak:**

Bibe şivan.(bûn-ferman)	Şivanî bibe.(birin-xwestek)
Bibe şerwanê azadiyê.(bûn-ferman)	Şerwanê azadiyê bibe.(birin-xwestek)

<sup>11</sup> Ji bo ku ew tevlihevî dernekeve divê di “birin”ê de bireser bê bikaranîn. “Ew zarokan dibe.”



Di hinek awayan de ji bo ku tevlihevî dernekeve qertafa dema bê “bi” dikeve. Ku ev qertaf neyê xistin, wateya lêkera “birin”ê derdikeve holê.

**Mînak:**

**Bûn**

Bila hindik be.  
Ez bim, ez wisa nakim.  
Kesê ku hat dê ew be.  
Bila ez bim.

**Birin**

Bila hindik bibe.  
Ez bibim ez wisa nakim.  
Kesê ku hat dê ew bibe.  
Bila ez bibim.

Di hinek awayên din de jî “bi” dikeve.

**Mînak:**

Sehet be ji te re.                      Ev tişt li me pîroz be.  
Noşîcan be ji we re.                Qewet be xwarzê!

**4. Pirsgirêka “hebûn”ê**

**a. Hebûn û dijbera wê:**

“He”navdêrek e û wateya “erê”yê dide.<sup>12</sup> Ji vê peyvê lêkera “heyîn”ê<sup>13</sup> jî bi dest dikeve. Ji vê navdêrê bi alîkariya lêkera “bûn”ê “hebûn” hatiye çêkirin. “Hebûn” jî xeynî wateya xwe ya “heyîn”ê, bi mirovî û hebûna wî re jî têkildar e û bûneweriyê dihewîne.

Dijbera peyva “he”ya ku wateya wê “erê”yê, “ne”<sup>14</sup> ye ku ew jî wateya “neyîn”ê dide. Li gorî vêya jî lêkera “neyîn”ê<sup>15</sup> hatiye çêkirin. Ji vê jî bi alîkariya lêkera “bûn”ê “nebûn”<sup>16</sup> hatiye çêkirin ku ew jî dijbera “hebûn”ê ye. “Nebûn” jî ber ku neyîniya lêkera “bûn”ê ye jî, hêmana neyînî “tu” hatiye pêşiya wê û jî “nebûn”ê ji bo dijbera “hebûn”ê, “tunebûn” hatiye çêkirin.

Ev herdu lêker jî ji ber ku ji hêmanên navdêr pêk hatine, di bikaranîna raweyan de divê ji “bûn”ê cuda bên nivîsîn. Lê dema ku em bala xwe didin nivîsaran, em dibînin ku “tune” bi pirranî ji “bûn”ê cuda tê nivîsîn; lê “he” ji hêmana “bûn”ê cuda nayê nivîsîn. Peyveke “kurt” e, dibe ku ji ber wê pê ve hatibe nivîsîn. Lê li gorî rê û rêzîkên lêkeran divê ji “bûn”ê cuda bê nivîsîn.

---

<sup>12</sup> Li hinek deveran ji bo peyva “erê”yê “e” tê bikaranîn. Tîpa “h”yê ji serêgellek peyvên Kurdî’yê ketiye. Di Dimilî’yê de jî “est” wateya “he”yê dide. Dema ku mirov tiştêkî “erê” dike pê re jî “heyîn” derdikeve holê. Dema ku mirov “na” dike “neyîn” derdikeve holê.

<sup>13</sup> “heyîn” rasterast wek lêker li gorî raweyan nayê bikaranîn.

<sup>14</sup> “ne” du wateyan dihewîne, 1. Dijbera “he”yê ye, 2. Wek qertafa “neyînî” tê bikaranîn. Di “nebûn”ê de, wateya yekem dihewîne.

<sup>15</sup> “neyîn” rasterast wek lêker li gorî raweyan nayê bikaranîn.

<sup>16</sup> “nebûn” û “hebûn” dijberî hev in, lê di heman demê de “nebûn” neyîniya “bûn”ê ye jî. Herwiha wek dijbera “hebûn”ê “nînbûn” jî heye û ew jî tê bikaranîn.

**b. Ji aliyê raweyên deman ve “hebûn”:**

Ji ber ku du wateyên lêkera “bûn”ê hene, ev herdu wate ji bo “hebûn”ê jî derbas dibin. Di vî awayî de jî wate ji hevdu dernavekin. Di awayê yekem de wateya “heyîn”ê heye, di awayê duyem de “bûn”ê heye.

**Mînak:**

**Hebûn/dema borî ya têdeyî-1**

Ew he bû.

Ew he bûn.

Di çenteyî de sêv he bûn.

**Hebûn/dema borî ya têdeyî-2**

Ew he bû.<sup>17</sup>

Ew he bûn.

Mirov he bûn.

Di awayê neyînî de qertafa neyînî “ne” ji awayê yekem cuda tê nivîsîn. Di awayê duyem de, ev qertaf bi lêkerê ve tê nivîsîn.

**Mînak:**

Ew ne he bû.

Ew he nebû.

Dema ku em van herdu awayan tînin dema niha, ferqa wan bi awayê teşeyî derdikeve holê. Di awayê yekem de wateya “heyîn”ê serdest e, di awayê duyem de wateya “bûn”ê serdest e.

**Hebûn/dema niha-1**

Ew he ye.

Ew he ne.

Di çenteyî de sêv he ne.

**Hebûn/dema niha-2**

Ew he dibe.

Ew he dibin.

Mirov he dibin.

Ji bo rewşa neyînî qertafa neyînî “ne” jê cuda tê nivîsîn. Di awayê duyem de ev qertaf dibe “na” û di şûna qertafa dema niha de tê nivîsîn. Di awayê yekem de li ji bo rewşa neyînî “nîn” jî tê bikaranîn, lê ew piştî “he”yê tê û wek peyvê tê bikaranîn.

**Mînak:**

Ew ne he ye.(heyîn)

Ew he nîn e.<sup>18</sup>(heyîn)

Ew he nabe.(bûn)

Ew he nabin.(bûn)

Di dema bê de herdu rawe dişibin hev; lê bêtir di awayê yekem de, qertafa dema bê “bi” dikeve.

**Hebûn/dema bê-1**

Ew ê he bibe.

Ew ê he bibin.

Di çenteyî de dê sêv he bibin.

**Hebûn/dema bê-2**

Ew ê he bibe.

Ew ê he bibin.

Mirov dê he bibin.

<sup>17</sup> Di vir de “bû” tê kirpandin.

<sup>18</sup> Di vî awayî de “nîn” wateya “hebûn”ê dike neyînî. Dema ku em bibêjin “Ew nîn e.” rasterast wateya dijbera “hebûn”ê dide. Ev awa bêtir tê bikaranîn. “nînbûn” û “nebûn” dijberên “hebûn”ê ne; lê lêkera “nebûn”ê di vî raweyê de wek “Ew ne ye.” nayê bikaranîn.

Ji bo rewşa neyînî di awayê yekem de “ne” cuda tê nivîsîn, di awayê duyem de dikeve şûna “bi”yê.

**Mînak:**

Ew ê ne he be.(heyîn)

Ew ê he nebe.(bûn)

**Nîşe:** Dema ku kirde û bireser, di heman hevokê de bîna bikaranîn “hebûn” wateya, xwedîtîyê dide. Ango ew kirde xwedî wê bireserê ye. Ji bo vî awayî carinan hinek hêmanên din jî tên bikaranîn.

**Mînak:**

Hespekî min he bû. Li cem wî, xalîçe he ne.

Min nanek he ye.<sup>19</sup> Bi min re hesp he ye.

**c. Li gorî deman dijbera “hebûn”ê “tunebûn”:**

**Tunebûn/dema borî ya têdeyî-1**

Ew tune bû.

Ew tune bûn.

Di çenteyî de sêv tune bûn.

**Tunebûn/dema niha-1**

Ew tune ye.

Ew tune ne.

Di çenteyî de sêv tune ne.

**Tunebûn/dema borî ya têdeyî-2**

Ew tune bû.

Ew tune bûn.

Mirov tune bûn.

**Tunebûn/dema niha-2**

Ew tune dibe.<sup>20</sup>

Ew tune dibin.

Mirov tune dibin.

Di dema bê de herdu awa dişibin hev; lê bêtir di awayê yekem de, qertafa dema bê “bi” dikeve.

**Tunebûn/dema bê-1**

Ew ê tune bibe.

Ew ê tune bibin.

Di çenteyî de dê sêv tune bibin.

**Tunebûn/dema bê-2**

Ew ê tune bibe.

Ew ê tune bibin.

Mirov dê tune bibin.

**Nîşe:** Ji bo dijbera “hebûn”ê “nînbûn” jî tê bikaranîn. Lê “nîn” ji ber ku qertafa neyîniyê nîn e, di awayê duyem de rasterast şûna “he”yê digire, lê awayê duyem pirr nayê bikaranîn.

**Tunebûn/dema borî ya têdeyî-1**

Ew nîn bû.

Ew nîn bûn.

Di çenteyî de sêv nîn bûn.

**Tunebûn/dema niha-1**

Ew nîn e.

Ew nîn in

Di çenteyî de sêv nîn in.

**Tunebûn/dema borî ya têdeyî-2**

Ew nîn bû.

Ew nîn bûn.

Mirov nîn bûn.

**Tunebûn/dema niha-2**

Ew nîn dibe.

Ew nîn dibin.

Mirov nîn dibin.

<sup>19</sup> Di vî awayî de, “hebûn”bi cînavkên diyarkirî re tê bikaranîn.

<sup>20</sup> Bûyera “tune-bûn”ê didome.

5. **Rastnivîsa “çêbûn”ê:** Bi alîkariya hinek qertafên wek “ra, ve, wer, hil<sup>21</sup>...”ê ji lêkera “bûn”ê lêkerên wek “rabûn”, “vebûn”, “werbûn”û “hibûn”ê tîr çêkirin. Hinek hêmanên wek “hil” û “wer”ê ji wateyên xwe yê peyvî dîr ketine û êdî bêtir wek qertafn tîr bikaranîn. Peyva “çê” jî di vî rewşê de ye û divê bi lêkera “bûn”ê ve bê nivîsîn, lê dema ku di wateya “baş”iyê de bê bikaranîn divê cuda bê nivîsîn.

**Mînak:**

Min xwarin çêkir.

Wî makîneyeke nû çêkir.

Te spartek çêkirin?

Me malikek çêkir.

Te çê(baş) kir.<sup>22</sup>

**Bahoz Baran**

**Nîşe:** Min navên demên borî ên wek “dema borî ya domdar”, “dema borî ya pêknehatî” û “dema borî ya nediyar” li gorî xebata rêzimanê ya ku min nû amade kiriye, bi kar anîn. Ev nivîs di kovara Çirûskê de hat weşandin.

**Çavkanî:**

1. Baran B.-Bilbil M.(2008) Rêzimana Kurmancî, Enstituya Kurdî ya Amedê
2. Bedirxan C.A. û Lescot R. (1991) Kûrtçe Dilbilgisi, Weşanên Dozê
3. Bozarslan M. E.(2008), Baxçê Zimên, Weşanên Dozê
4. Bozkurt A. (2008)Kesandina Lêkerên Kurmancî, Weşanên Dozê
5. Ebdulfettah D. (2011) Kar(lêker), Enstituya Kurdî ya Amedê
6. Kurmancî Rojname (2011) Weşanên Avestayê
7. Ronahî, Kovar, (2010) Weşanên Belkiyê

---

<sup>21</sup> “Hil” di hinek lêkeran de wek peyv jî tîr bikaranîn, “hilandin”, lê bêtir wek qertaf tîr bikaranîn û bi lêkeran ve tîr nivîsîn.

<sup>22</sup> Di vî awayî de “çê” tîr kirpandin.